# Efrîn di bin dagîrkeriyê de (164):

## Guhertina demografî li Gundê "Sînka" û Bajaroka "Bilbilê", vekirina navend û dibistanekê ji bo turkirin û tundrewiya olî, girtin, pakrewanbûna zarokekê û bombebarankirina hin gundan



مزار «شيخ غريب» قبل وبعد التخريب- قرية «سينكا».



شجرة زيتون تم قطعها بشكل جائر، في حقل عائد لـ"حميد سيدو"- قرية "سينكا"، كانون الأول ٢٠١٩م.



ديار عبد القادر سيدو



اجتياح الميليشيات الموالية لتركيا لبلدة بلبل ٢ شباط ٢٠١٨م.



افتتاح مركز "يونس أمره" الثقافي التركي في مدينة عفرين، ٢٠٢١/٩/٢٢م.



افتتاح مدرسة "الإمام الخطيب" في مدينة عفرين، ٢٠٢١/٩/٢٤م.



الشهيدة الطفلة "روليف محمد علي"



منزل «مروان بركات» في قرية «سوغانك»- شيروا، قبل وبعد التدمير.



قصف منزل "جمعة خليل خضر" في قرية "قنيتره"- شيروا، ٢٠٢١/٩/٢٤م

Hebûna leşkerî ya Turkiyê li Bakurê Sûriyê -şivanperwerê giropên çekdar ên tunderew- dimîne jêdera gizgizî û gefguriyê ji tevahiya Sûriyê û binpêkirinê ji serweriya wê re, herweha dagîrkirina Turkiyê û nandozên wê ji Herêmên Kurdî re, metirsiyeke mezin li ser hebûna Kurdan û rola wan çêdike, û dibe sedema fîtnê di nav wan û Erebên Sûriyê de.

Ev jî beşek ji encam û şopemayînên dagîrkirina Herêma Efrînê ye:

**= Gundê "Sînka":**

Bi Navça Şera ve girêdayî ye, bi aliyê Rohilat ve /1/KM ji navenda wê dûr e, ji dora /325/malan pêkhatî ye, dora /1700/nişte ji nişteciyên Kurd ên resen -jê 50% Êzdî- têde bûn, piraniya wan niştecîyan bi zorane hatin koçberkirin, dora /70malbat=280nişte - jê pênc malbat li vê dawiyê-vegerîn gund, û dora /1500/nişte ji anîndeyan têde hatin niştecîkirin.

Di dema êrişkeriyê de, çend caran gund hate topebarankirin, deh mal rengereng ziyan gihîştinê, jê mala Duktor "Zilfî Sîdo" bi rengekî pir û mala "Hisên Sîdo" jî bi tevahî hatin roxandin.

Milîseyên "Elcebhe Elşamiyê" gund desteser dikin, û piştî ku tevahiya kelûpel û deriyê derve yê mezin ên mala Hemwelatî "Fadêl Behrî Çawîş" dizîn ew ji xwe re kirin biryargeheke leşkerî, û binehiya wê jî kirin hepsek ji bo lêkolînkirin û işkencekirina revandiyan.

Piştî desteserkirina gund, milîseyan ji tevahiya malan alavên baqirî, cerên gazê, şaşên tilvizyûnan û amûrên elektirîkê dizîn, paşê jî dest danîn ser dora /250/ malî tevî kelûpelên wan ji xwarinvexwarinê de bigir ta raxistok, alav û tiştên din; Herweha jî /8/tirektorên çandiniyê (jê yên "Dilovanber Behrî Fadêl Çawîş, Reşîd Hemîd Horo"), teksîk "Dayo" ye "Cangîn Ebid Elmenan Çawîş", otombîlek "Sozekî" ye biçûk e "Elî Mihemed", giropeke Zayenda elektirîkê (Ampêran) e "Rif'et Misto" ye ku elektirîk dida gund, û hemî kebil, stûnên darî û guheztoka toreya elektirîkê ya giştî, dizîn.

Û dest danîn ser 50% ji malmewalên xelkê gund -bi taybetî jî yên ne li wir- ên dora /25/hezar darên biber ên zeytûnê û hin tişt din, jê yên "Malbata Henan Reşo, Xelîl Zezrob, Hemûş Reşo", û dora /70/darên zeytûnê yên hemwelatiyê zorane koçberbûyî "Hemîd Seydo", û 50% ji /22/hezar darên ihracê li sê daristanên ku li sala 1980 li Rohilatê gund hatine çandin, ji bo êzingkirinê, bi rengekî hovane û bê wijdan qut kirin.

Û vêrgiyên têkel li ser werzên hemwelatiyên hene ferz dikin.

Zaretgeha "Şêx Xerîb" a Êzdî - Islamî li gund hate pêlîskandin û xerakirin, û li Tebaxa (Gelawêja) 2021an ji aliyê xelkê gund ve hate çaksazkirin.

Û xelkê gund rastî cûrbecûr binpêkirinan hatin, jê revandin û girtinên bêsûcane, kêmrûmetkirin û peresitandin, nimûne jî bêtirî deh kesan hatin girtin û tûşî işkencekirinê bûn, jê temenmezin "Çawîş Umer Çawîş /70/sal" li Gulana 2018an, û di dû re kurê birê wî "Cim'e Çawîş" ê ku di tiwalêta binzemînî de ya birayargeha "Elşamiyê" deh rojan hatiye bendkirin, weha jî herdu ciwan "Mes'ûd Nedîm Qasêm û Nedîm Şêxo Qasêm - xwediyê pêdiviyên taybet" hatin girtin û birin Bajarê Ezazê, û pişt re Milîseyên "Elşamiyê" tene ji bavê "Mes'ûd" re jî reşandin û hindik-hindik anîn Ezazê, û li pêş ûtêla ku ew lê radibûrûdinişt pîkaba wî ya Mazde jê dizîn.

Û di encama teqîna bombeyeke zemînî de, li goristana gund, li siba roja yekê ji Cejna Rojiyê, li 16.6.2018an, "Diyar Ebid Elqadêr /14/sal" şehîd ket, û hin din jî birîndar bûn.

**= Guhertineke demografî fere li Bajaroka "Bilbilê":**

Di navboriya hefta yekê ji dijberiya Turkiyê li ser Herêma Efrînê de (ji destpêka /20/î Rêbendana 2018an), şer gihîşte Bajaroka Bilbilê, ji ber ku nêzîk sînora bi Turkiyê re ye, û bi aliyê Bakur ve /43/KM ji Bajarê Efrînê dûr e; Ji ber wê jî xelkê wê penaberî hundir bûn, û piraniya wan piştî dagîrkeriya Efrînê li 18.3.2018an, zorane bo derveyî herêmê hatin koçberkirin.

Bajarok ji dora /750/malî pêkhatî ye, bêtirî /3/hezar nişte ji niştecîyên Kurd ên resen têde bûn, jê /51malbat=220nişte/vegerîn, /59malbat=260nişte/di nav Bajarê Efrînê û gundên derdorê de mişexte bûn û qedexe bûn ku vegerin ser cîwarên xwe, û dora/3750/nişte ji anîndeyan lê hatin niştecîkirin, piştî destdanîna ser dora /700/mal tevî tevahiya kelûpelan ji aliyê milîseyan ve; Lê li vê dawiyê /5/malbat ji Bajarê Heleb vegerîn, lê nikanîn malên xwe bidestbixistana yan li bajarokê rûniştana, û tenê malbatek ji wan kanî di mala dêpîra xwe de rûnişta.

**= Turkirin û Osmaniya nû û tundrewiya olî:**

- Li destpêka Rezbera em tê de, korsa asta sisiyê ji zincîra "Çandina perensîpên olî û perwerdekirina civakê li ser" li "Kargêriya ewqafa Efrînê" yê giropeke ji xoce(îmam), gotarbêj, û mamosteyên mêr û jin, bi

serpereştiya şandêrê "Weqfa Diyant a Turkî - Mihemed Nûr Hemdan" hate bidawîkirin, li rex gelek çalakî û korsên din ên olî yên ku çînatên têkel ên civakê dikin armanc.

- Di çarçewa zincîra amojgehên Weqfa Turkî de yên taybet bi belavkirina ziman û çanda Turkiyê ya ji bo Turkirina gelên armanckirî, li 22.9.2021an, bi beşdariya "cîgirê serokê Encûmena Xwecihî li Efrînê" û "Ce'ifer Goçer - hevrêzkarê giştî yê Turkî ji bo hînkirinê li Şaxa Zeytûnê", "Navendeke Çandî Turkî" bi navê "Yûnês Emreh - e ji bo hînkirina Zimanê Turkî û hunerên têkel", hate vekirin.

- Li 24.9.2021an, bi beşdariya "cîgirê serokê Encûmena Xwecihî li Efrînê" û "Cengîz Samanlî - hevrêzkarê giştî yê Turkî yê ji bo perwerdekirin û hînkirinê li Bajarê Efrînê", Dibistana "Elîmam Elxetîb" (ya ji aliyê "Komela Destên Sipî ve- Turkiyê" û peredayîna "Komela Elşêx Ebdela Elnûrî Elxeyriyê ve - Dewleta Elkiwêt" hatiye avakirin), li bajêr hate vekirin, û bi vê rengî ev dibe dibistana olî -nimûneya Turkî- ya sisiyê ku li bajêr tê vekirin, li kêlek dibistaneke din li Bajarê Cindirêsê û dibistana ku niha li Bajaroka Şera tê avakirin, ji bo belavkirina çanda Osmanî ya nû û tundrewiya olî ya Islamî.

**= Girtinên bêsûcane:**

Destlatên dagîrkeriyê ev girtin:

- Li 16.9.2021an, xortê ciwan "Welîd Mihemed Ne'isan /20/sal" ji xelkê Gundê "Umera - N.Reco", ji aliyê rêbenda asayişê li çateriya B.Ezazê ve, li dema ku ji Heleb vedigeriya Efrînê, û ta niha çarenûsa wî ne xuya ye.

- Li 17 9 2021an, Hemwelatî "Ebdo Mihemed Umer/29/sal" ji xelkê Gundê "Gemrûkê" - N.Mabeta, li dema beşdarbûna wî li dadehkirina gundiyê xwe Hemwelatî "Mihemed Hisên Şêxo/56/sal" li Ezazê (yê ku li heman ciyî li 18.8m2021an hatiye girtin); û piştî ku herdu bi têkildariyê bi Rêvebiriya Xweser a berê re tewanbar kirin û li ser her yekî jî /1500/PT vêrgî ferz kirin, li Şeva Carşemê 22.9.2021an ew berdan.

- Li 17.9.2021an, Hemwelatî "Bêriqdar Mihemed Mistefa/53/sal" ji xelkê Gundê "Aşkê Xerbî" - Navça Cindirêsê, dema ku tevî malbata xwe ji Bajarê Heleb vedigeriya Efrînê, ji aliyê Milîseyên "Elcebhe Elşamiyê" ve - rêbenda çekdar a li Cateriya "Kefircenê", bi behaneya ku birayê wî di Partiya Karkerên Kurdiatanê de rêvebir e, û ta niha bendkirî ye.

- Li 18.9.2021an, Hemwelatî "Xelîl Tahêr Mihemed/45/sal" ji xelkê Gundê "Qîbarê" - B.Efrînê, ji aliyê rêbenda cekdar ve li Bajarê Ezazê, û ta niha çarenûsa wî ne zelal e.

- Li 19.9.2021an, Hemwelatî "Hebeş Reşîd Hebeş /30/sal" ji xelkê Bajaroka "Be'idîna", li dema hevaltiya wî ji hevjîna xwe ya nexweş re li Nexweşxana "Şemarîn" - Ezazê, û li 23.9.2021an jî hate berdan.

- Li 21.9.2021an, hemwelatî "Siltanê Cewad/50/sal" - hevjîna "Mihemed Reşîd Elî" ji xelkê Gundê "Avrazê" - Navça Mabeta, û li 23.9.2021an hate berdan.

**= Geregoşî û serberdayetî:**

- Li 22.9.2021an, Milîseyên "Firqit Elsultan Mûrad" li navenda Navça Bilbilê koneke sersaxiyê ye bavê çekdarekî mirî(yî ku li nav herêmên desteseriya Artêşa Sûriyê miriye) rakir, bi behaneya ku mirî "peyayê rijîmê bû", ji ber wê di nav endamên wê û çekdarên êla mirî de li Bajaroka Şera pevçûnina rûdan.

- Li 22.9.2021an, di navêna Milîseyên "Lîwa'i Siqor Elşam" û "Ceyş Elnixbe" de, li gundên "Ebûdanê û Şêxorzê" - N. Bilbilê, bi sedema hevrikî û nakokiya li ser destlat û dizînê, pevçûnin mekin derketin, û hin endam birîndar bûn; Û ji ber ku di hebûna li hin gundên din de jî hevpar in, vêca li wan deran jî herdu aliya endamên xwe kirin amedebaşiyê.

- Li Siba Pêncşemê 23.9.2021an, bombeyeke zemînî li kêleke salonek teksî "Van", li Taxa Eşrefiyê li B.Efrînê, hate teqandin, û di encamê de tenê ziyanin şênberî çêbûn.

**= Teqîna bombeyeke zemînî:**

- Li Carşemê piştî Nîvro 22.9.2021an, bombeyeke zemînî ji bermayên milîseyan, li nêzîk stasyûna tirênê li Bajaroka "Elehdas" - Bakurê Heleb teqiya, û di encamê de çar zarok ji koçberên Herêma Efrînê birîndar bûn, û ew jî ev in: hersê bira "Mihemed/6/sal" û "Esmet/12/sal" û "Zûhêr/14/sal" kurên "Teter Exres" ji xelkê Bajaroka Kefirsefrê, û "Rûlêv Mihemed Elî /8/sal", dema ku ji xwe re li wir digeriyan, û bi şev piştî çend katan ji dermankirinê li nexweşxaneyeke Helebê, ji ber encama birînên kûr, "Rûlêv" mir.

= Li Şeva Yekşemê 19.9.2021an, Artêşa Turkiyê û nandozên wê, Gundê "Soxanekê" - Şêrewa yê di bin desteseriya Artêşa Sûriyê de û li ser xêza hevgîhanê bi aliyê dagîrkirî re û ji nişteciyên wê koçberkirî topebaran kirin, û ziyanin şênberî gîhandin hin malan, jê mala Helebestvan "Merwan Berekat" bi tevayî hate roxandin, ya ku careke berê jî avêjtekeke mûşekî lêketibû.

Û li Roja Înê 24.9.2021an, Gundê "Qinêtrê" - Şêrewa (yê ku li Rohilatê G."Soxanekê" dikeve) jî topebaran kirin, û li gor Ajansa Hawarê, ziyan gihîşte mala Hemwelatî "Cum'e Xelîl Xidir".

Bidawîkirina dagîrkeriya Turkiyê û hebûna milîseyên nandoz erkeke mirovahî û niştîmanî ye, û ji bo danîna rêgirekê ji binpêkirin û tewanan re û serastkirina demografiya herêmê, pêngaveke serekîn e.

26.09.2021an

**Nivîsgeha ragihandinê- Efrîn**
**Partiya Yekîtî ya Demokrat a Kurd li Sûriyê**

--------------------------

**Wêne:**

- Dareke zeytûnê ji zeviyê "Hemîd Seydo" - G."Sînka" bê wijdan hatiye qutkirin, Berfenbara 2019 Z.
- Zaretgeha "Şêx Xerîb" berî û piştî roxandinê - G."Sînka".
- Pakrewanê negîhayî "Diyar Ebid Elqadêr Seydo" - G."Sînka", 16.6.2018 Z.
- Êrişkirin û talankirina milîseyên bi ser Turkiyê ve ji Bajaroka "Bilbilê" re, dudiyê Reşmehê 2018 Z.
- Vekirina Navenda "Yûnis Emreh" ya çandî ya Turkî li Bajarê Efrînê, 22.9.2021 Z.
- Vekirina Dibistana "Elîmam Elxetîb" li Bajarê Efrînê, 24.9.2021 Z.
- Pakrewana zarok "Rolêv Mihemed Elî", 22.9.2021 Z.
- Mala "Merwan Berekat" li G."Soxanekê" - Şêrewa, berî û piştî topebarankirinê.
- Tobebarankirina Mala "Cim'e Xelîl Xidir" li G."Qinêtrê" - Şêrewa, 24.9.2021 Z.